


**WILLKOMMEN  
BAINVEGNI  
BENVENUTI**

Zaniyarî ji bo kesên nûhatî





# **ZANIYARÎ JI BO KESÊN NÛHATÎ**

**Beş û berpirsiyariya guncandinê**  
[www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch)  
[www.hallo.gr.ch](http://www.hallo.gr.ch)

# NAVEROK

<b>1</b>	<b>Allegra, Grüezi, Buongiorno</b>	<b>9</b>
<b>2</b>	<b>Zanîn û zanyarî liser Swîsra (Esvîçra)</b> Zanyariya liser dewletê û çîrokeke kin	<b>10</b>
<b>3</b>	<b>Zanîn û agahdarî liser Herêma Graubünden</b> Hijmar û belge (fakt)	<b>12</b>
<b>4</b>	<b>Dewlemendiya zimanan li herêma Graubünden</b>	<b>14</b>
<b>5</b>	<b>Goncandin (Integrasyon)</b> Navenda Agahdariyê ya Întegrasyonê Graubünden Zaniyarî bi pirr zimanan li ser platforma <a href="http://www.hallo.gr.ch">www.hallo.gr.ch</a>	<b>17</b>
<b>6</b>	<b>Pêwendî</b> Ziman meftiha guncandin û integrasyonê serekêyîye! Pêwendîpeydakirina wergeran (tercûmanan)	<b>19</b>
<b>7</b>	<b>Kar</b> Guncandina pişeyî Baca liser mûçe (maaş) û sîgorta Li kargerîn Çibikin ger bê karbin? Karê bi reşî Pişefêrbûn û xwepêşxistina dû pişefêrbûnê Sepandin û qebûlkirina dîplomên biyanî	<b>20</b>
<b>8</b>	<b>Destûrdana manê û Anîna malbatê</b>	<b>24</b>

**9****Mahrkirin (Zewac) û malbat****25**

Mahrkirin (Zewac)

Hevjîn û malbatên du-neteweyî

Hevseriyên qeydkirî

Zewaca bi zorê

Jidayîkbûn

Mana dayikên zarok li mal û mûçê û maaş wan, Perê dema çavdêriya nûdayîkan

Perê piştgirîya malbatê

**10****Zarok****28**

Mezinbûn bi pirzimanî

Şêwîrya dê û bavan

App-ên malbat- û dê û bavan

Deynkirtina pirtûk û lîstikan

Bernameyên çavdêrîkirinê

Hêla rewşa tengav ya dê û bavan

**11****Xwendegeh û pişefêrbûn****30**

Berpîrsiyariya dê û bavan

Şîret kirina bê pere ya li ser meslekan ji bo keç û xortan

Xwendegehên berdewamîya xwendinê û xwendegehên pişe

Bernameyên navberê

Ciwanên ku dereng koç kirine

Gymnasien, Xwendegehên bazirganî – û yê navendîyî ê beşan

Pişefêrbûn

Bekaloriya pişeyî

Xwendina bilind û xwendina bilinda di beşên huner û xwendinê jiboyî

karê sazîyen netewî û navnetewî

Xizmetguzariya derûniya (pisîqolojîya) xwendegehê

Tundûtîjî (şidet) li dijî zarokan

Pisîkiyatîriya zarok û Ciwanan Li Graubünden

<b>12</b>	<b>Cênişîn û bicîhbûn</b>	<b>35</b>
	Lêgerîna li xaniyan jiboyî bikirê girtin Cihê şîretkarî û amojgariya yasa û zagone kirê	
<b>13</b>	<b>Tenduristî</b>	<b>38</b>
	Navnîşanên bijîşkên jin û bijîşkên mer Nexweşî yan belabiserde hatin (qeza kirin) Nexweşxane Şîretkarî û amojgarî û guhdan û çavdêrana li mal Mirovên bitemen, wate mirovên kal û pîr Mirovên kêmandam, wate mirovên kêmaniyek li wan hebe Mirovên bi pirsgirêk û astengiyên derûnî	
<b>14</b>	<b>Sîgorta</b>	<b>40</b>
	Sîgortayên neçar û mecbûr Sîgorta dema nexweşketinê a bingehîn Erzankirina abonê mehane ê Sîgortayên jiboyî dema nexweşketinê Sîgorta bela biserdehatinê Sîgortên serbest wate bi azadiya xwe	
<b>15</b>	<b>Bac</b>	<b>42</b>
<b>16</b>	<b>Şîretkarî û amojgariya civakî û komelayetî</b>	<b>43</b>
	Şîretkarî û amojgariya civakî a kesî Alîkariya civakî û komelayetiya darayî	
<b>17</b>	<b>Jiyana rojane – çavpêketin û hevdîtin</b>	<b>44</b>
	Jiyana taxê, tarê û mehalê / Jiyana gund Komele û Club Kemelê bêgane û biyaniyan Mozexane, şano û sîneme Kirîn û çûna kirînê Bank	

Rojên valeyê û betalbûnê (rojên pişû)  
Seyran û demên destbetaliyê

---

**18** **Gîhandin û guhaztin (Mobîlîte)** **47**

Tevdêr û haletên hatûçûwê komelayetî (ÖV): Şemenefer, trêna û otobûs  
Ajotina trimbêlê li Swîsre  
Velo (Piskilêt)

---

**19** **Jîngeh (derdor)** **50**

Jîngehê biparêzin!  
Sêvok û ziblê (çopê)  
Ava vexwarinê

---

**20** **Navnîşan û lînkên giring** **52**

Xemên rojane  
Kar  
Cûdakarî/Nijadperestî  
Mahrkirin (Zewac) û malbat  
Darayî  
Tenduristî  
Tundûtîjî (şidet)/Alîkarî ji qurbaniyan re  
Întegrasyon/koçberî  
Wergera devkî di navbera çandan de  
Zarok û ciwan  
Ragihandina xelkê koçber  
Xizmetên civakî  
Xwendegehên ziman  
Dad

---

**21** **Ku ketin tengayiyê çî bikin?** **64**

**Berpirsiyarî** **66**

---





# ALLEGRA, GRÜEZI, BUONGIORNO

## Rêzdaran kesên nû hatîn

Ez dixwazim bi navê desthilata herêma Bündner bi dil û can bixêrhatina we ji bo Kantona me bikim.

Bi niştecihbûna we di Kantona me de hûn dibin beşek ji civaka me ya rengareng, ku ji gelek komên millet û netewan pêk tê. Ev kom ne tenê ji aliyê ziman, esil û çanda xwe ve ji hev cuda ne, lê belê hem ji aliyê temen û pîşe û omîd û daxwaziyên xwe ve jî gellek cûdabûn di navbera wan de hene. Anku jiyana di pirrengiyê de li Graubünden beşek e ji jiyana rojane ye û ev tişt hem derfetên baş bi xwe re tîne hem jî zehmetiyên xwe hene.

Graubünden pirrreng e û bi derfetên xwe jî zengîn e û dikare gelek tiştan pêşkêşî we bike. Wek mînak di nav siruştā me de 150 newal, 615 golên avê û 937 serçiya hene. Zimanên me yê fermî elmanî, ratoromanî û îtalî ne. Ma gelo te zanîbû, ku ratoromanî li seranserî Swîsrayê bi tenê li Graubünden tê axaftin û ku ew ne zimanek bi tenê ye, lê belê malbatek e, ku ji pênc devokên herêmî pê tê: Sursilvan, Sutsilvan, Surmiran, Puter û Vallader? Em bi çand û rê û rism û rewîştên xwe yê ku bi sedên salan kevin in, serbilind in, û me di heman demê de jî cihê xwe di çerxê nû de girtiye û em dixwazin bi we re paşeroja xwe ya civakî dirust bikin.

Gellek destpêşxerî û projeyên li Kantonê – di nava wan de gellek pêşniyazên piştevan ji bo hevguncînê – hene, ku piştgiriya bihêzkirina yekîtiya civakî dikin. Heger em destên xwe bikin destên hev, emê bi hêz bibin û girêdayî vê axaftinê, em ji we daxwaz û hêvî dikin, ku hûn tevî jiyana me ya çandî, aborî û civakî bibin.


Xwe li ba rêvebiriya gundê xwe yan ya devera xwe yan li ba rêvebiriya Kantonê ji bo karûbarên hevguncînê li ser pêşniyaz û xizmetgûzariyên agahdarî û şêwirdarî û kursên xwendinê agahdar bikin. Beşdariyê di van xizmetgûzariyan de bikin û sûdê ji wan derfetên, ku ew pêşkêşî we dikin, bikin.

Em hêvî dikin, ku destpêka we di Welatê we yê nû de baş be.

**Peter Peyer**

Rêvebirê Herêmê

# ZANÎN Û ZANYARÎ LISER SWÏSSRA (ESVÎÇRA)



## Hijmarên (2019)

Hijmara niştecéhan	8'606'000
Hemwelatîyên biyanî	25.3 %
Mezinahiya xak	41'300 km2
Herêm	26

## Zanyariya liser dewletê û çîrokeke kin

Di 1 îlona 1291 an de hevgirtineke şist dinavbera xelekên newalan de bi «Sûndxwariya mêrê berê» (Alte Eidgenossenschaft) di navbera van cihan de Uri, Schwyz û Unterwalden hate damezrandin û afirandin. Dûvre yanî yeko yeko û bi demêre çend cih û deverên dinjî tevî vê peymanê bu. Û wuha welatê taze, nû û hemdem Dewleta Federal Siwîssre (Esvîçra) di sala 1848 hate demezrandin û afirandin. 1 e îlonê roja netewiya Siwîssre (Esvîçra) ye.

Siwîssre (Esvîçra) welatekî demoqratiya rasûxwe ye, Jin û zîlamên mafê wanî hîlbijartinê heben karin ne tenê di riya hîlbijartinan de tûjîn û tesîra xwe li polîtîkê bikin, belkî di riya gelek dengdanan dengdanên netewî rastûxwe liser yasa, zagon û qanûnan û pirsên liser daw û dozan ji tesira xwe dikin. Mafê beşdarîbûn û tûjîn û tesîr kirin liser asta Federal, asta Herêman û asta navçan heye jî heye. Jin û merên Siwîssre (Esvîçra) ji 18 salî u pêve mafên hîlbjartin werdigrin.

### Zimanên sereke

61.2 %  
Almanî

22.3 %  
Ferenî

8.0 %  
Îtalî

0.5 %  
Romanî

23.8 %  
Zimanên din  
(BFS 2017)

Hûn di karin Zanebûn û zanyariyên bêhtir liser zanyariyên liser dewletê di Broşûra «Echo» de bibînin. Eve jî kare bê dawê kirin û daxwaz kirin di rêya hemû cihên pirtûkan difroşin de yan jî di rêya **HEKS, Regionalstelle Ostschweiz (Cih û devara xwestinê li Rojhilatê Siwîssre (Esvîçra) Ostschweiz)**

☎ 071 410 16 84  
www.echo-ch.ch

# ZANÎN Û AGAHDARÎ LISER HERÊMA GRAUBÜNDEN




## Hijmar û belge (fakt) (2019)

Bêhtir ji 199.000 cêniş û runiştvanên li herêma Graubünden dijîn. Bi nêzîkê 37.300 î ji wan re hemwelatîyên welatekî biyanî hene. Mezinahîya xaka Graubünden 7106 km<sup>2</sup> e û êrdnîgarî ew mezintirîn herêmên Swîsre ye û nêzîkî 1/6 ji xaka welatê Swîsreye. Nêzîkê

35.400 mirov li Chur li paytextê dijîn, ew jî yek ji kevintirîn cihên Swîsre yên mirov li djîn e.

Ew Kanton di 11 Hereman û 106 Bajarokan hatîyê parçe kirin. 50 % ji gund û tax, tar û mehelên wê hijmara cêniş û runiştvanên wan kêmîr ji 1000 mirovîne.



Hijmara newalan	150
Hijmara gola	615
Hijmara serên ciya	937

Zanîn û agahdariyên din hûn di karin li ve malpere [www.gr.ch](http://www.gr.ch) bibînin

# DEWLEMENDÎYA ZIMANAN LI HERÊMA GRAUBÜNDEN



## Zimanê herêmê Graubünden

- Almanî
- Romanî
- Îtalî

## Li herêma Graubünden sê zimanên fermî (resmî) hene: Almanî, Romanî û Îtalî.

### Almanî

Zimanê dayîkê yê bêhtir (zorbê) cêniş û nişteciyên herêmê zimanê Almaniyê, wate bi Almaniya bilind (Bi zimanê Almanî bilind) dinivîsin û bi zimanê Almanîya Swîsre dipeyîvin (di axivin û deng dikin).

### Romanî

Li Engadin, li Münstertal, di Mittelbünden de û di Surselva Romanî zimanê gelemperî ye peyvîn û gotinêye. Romanî ne tenê zimane, belkî bêhtir jiwêye, ew malbateke ji 5 grupên bi taybetmendiyeke girêdana bihevvene, wate 5 (Idom) in ew jî evin: Sursilvan, Sutsilvan, Surmiran, Puter û Vallader.

### Îtalî

Bi Îtalî li çar newal û dolan de Puschlav, Bergell, Misox û Calanca dipeyivin û dengdikin.





## GONCANDIN (INTEGRASYON)

Guncandin û integrasyon projeyekî civakî, kesî, dînamîke girêdaye û bestîye bi erk û mafan ve û armanca vî projeyî beşdarîya, çaresekirina hemû kom û endamên civak û komelgehê di jîyana aborî û civakî de. Piştgirî kirina guncandin û integrasyonê ligor ve û prensîba «piştgerîkirin û jêxwestin» wate «bide û bistîne» ye. Bi taybet piştgirîya fêrbûna ziman, xwepêşxistina kar û pîşe û beşdarî li jiyana civakî û komelayetî. Fachstelle Integration (Beş û berpîrsiyarîya guncandinê) hevkarî û birêve birina piştgirîya taybet bi guncandin û intergrasyonê liser astê herêmê û liser astê gund û tax, tar û mehelan. Herwuha piştgêriya jiboyî projeyekê guncandina civakî û komelayetî û zanîn û agahdariyên pêwendî bi guncandinê ve hebin liberdestan datîne.

**Fachstelle Integration Graubünden  
(Beş û berpîrsiyarîya guncandinê)**

☎ 081 257 26 38

[www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch)

**Navenda Agahdariyê ya  
Întegrasyonê Graubünden**

Di avahiya Pêzaneçihê Întegrasyonê

ya li Grabenstrasse 1, Chur de Navenda Agahdariyê ya Întegrasyonê ya van xizmetan pêşkeş dike, heye:

- Navbêhnkariya dayin û sitandina agahdariyan û şewirmendiya hêsan ya giringeyên babetên integrasyonê û pîrsyariyan
- Dîneyeke kursên ziman û pêşkêşên integrasyonê yên li Kantonê tene dayin.
- Şewirdariya ziman ya kesayî û tenayî çêkirina bi derfetan testeke nerdewantî ya ziman

**Informationszentrum Integration  
Graubünden (Navenda Agahdariyê ya  
Întegrasyonê)**

☎ 081 257 36 83

Pêşşaneyên di derbarê demên vekirî de hûn li ser malpera [www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch) dibînin.

Hun li ser Malpera ya Înternetê ya Pîrzimanî [www.hallo.gr.ch](http://www.hallo.gr.ch) agahiyên kêrhatî li ser mijarên Rojane yên girîng wek Jîyana li Graubünden, Kar, Dibistan, Tendurustî û Jîne peyda dikin.

[www.hallo.gr.ch](http://www.hallo.gr.ch)



# PÊYWENDÎ

## Ziman meftiha guncandin û integ- rasyonê serekêyîye!

Hûn dixwazin li cihê rûniştina xwe yê nû bi rengê çalak û wekhev di jiyana abûrî, kulturî, çandî û civakî de beşdar bibin? Zanîna baş a zimanê herêmî deriyên li ber we vedike. Seredana kurseke zimanî bikin û Appên fêrbûna zimanî bi kar bînin, daku hûn di jiyana rojane de bikaribin danûstandineke baş bikin.

Lîsteyeke navên wan xwendin-gehên zimanî ew ên li Kantonê heyîn, hûn dê li jêr xaneya «Navnîşan û lînkên giring» bibînin. Di heman demê de malpera [www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch) kursên ziman yêni niha heyîn jî diyar dike. Ji bo bêhtir agahiyên li ser fêrbûna zimanî an ji bo şêwirmendiyeke kesane, hûn dikarin bi Navenda Zaniyariyan ya Integrasyonê re bikevin têkiliyê.

### Informationszentrum Integration Graubünden (Navenda Agahdariyê ya Întegrasyonê)

☎ 081 257 36 83

Pêşaneyên di derbarê demên vekirî de hûn li ser malpera [www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch) dibînin.

## Pêwendîpeydakirina wergeran (tercûmanan)

Fêrbûna zimanê herêmî girîng e. Ji bo têgehiştineke baş di danûstandin û civînên girîng de, dibe pêwîstî bi wergêrê hebe, ew dikare alîkar be.

Arge Verdi – Interkulturelles Dolmetschen in der Ostschweiz (wergera devkî ya pîrr-çandî li Rojhilatê Swîsreyê) wergerên pîspor ên pîrr-çandî ji bo derdora 60 zimanan peyda dike. Ev xizmet bi pere ye.

### Arge Verdi – Interkulturelles Dolmetschen in der Ostschweiz (wergera devkî ya pîrr-çandî li Rojhilatê Swîsreyê)

☎ 0848 28 33 90

[www.arge.ch/verdi](http://www.arge.ch/verdi)

Xizmeta wergerandinê bi rêya telefonê di çend xolekên de, wergerên pîspor pêşkêş dike -ji bo hinek zimanan ev xizmet bi şev û roj heye, 365 rojan di salê de. Ev xizmet bi pere ye.

### Xizmeta wergerandinê bi rêya telefonê

☎ 0842 442 442

[www.0842-442-442.ch](http://www.0842-442-442.ch)

# KAR

## Karkirin li cihê, ku kesê din kêfa xwe dikin û demên xweşiyê radi-buhêrin!

Çanda navneteweyî li Graubünden heye. Tûrîzim beşa aborî ya giring e û biser van beşê dinê aborî ve xware, beşê tenduristiyê, kargehên piçûk û navîn, gelek karbidestên liser astê netewî û navnetewî kar û xebata xwe dikin, herwuha birêvebirîya herêmê gelek cihên kar, ên rind û baş ji kar û pîşeyên cuda cuda pêşkêş dike.

## Guncandina pîşeyî

Karkirin bingeha jiyane misoger dike û piştgirîya guncandinê di civak û komelgehê de dike. Mercên destbikar kirinê û ketina nav cîhana kar û xebatê destûra kar û zanî-neke baş ji zimanê navçê re. Hûn karin li van malperê jêrîn zanîn û agahdariyên pêwîst jiboyî standina destûra karkirinê a pêwîst jiboyî kar û xebatê bibînin.

[www.kiga.gr.ch](http://www.kiga.gr.ch)

[www.afm.gr.ch](http://www.afm.gr.ch)

[www.sem.admin.ch](http://www.sem.admin.ch)

[www.swissuni.ch](http://www.swissuni.ch)

[www.berufsberatung.ch](http://www.berufsberatung.ch)

[www.migraweb.ch](http://www.migraweb.ch)

## Baca liser mûçe (maas) û sîgorta

Hinek bac bi mecbûrî û bê qeydûşert ji mûçe (maasê) mirov têne birîn, ewjî bacên jiboyê sîgorta xanenîşeyî (emeklîtî) – û mîra-tê (AHV – 1. Säule), xanenîşeyî kêmendamiyê (IV), Sîgorta betalî û bêkariyê (ALV), sîgorta bela biserdehatinê (UV) ne. Heger mûçe û maasê mirov ji radeyekê sinorekî derbas be û hatine mirov a salê ji CHF 20.000,- û biser ve be, hingê dibe baca xemxwariya paşerojê (nav jî lê dikin sitûna didiwa) weke temakirina AHV tê birîn. Di zik hevde bac û sîgortên neçarî û bi mecbûrî tên birîn nêzîkî ji 15 % ji mûçe, wate hatina salane têne birîn.

## Li kargerîn

Mirov dikare li ba navendên Regionalen Arbeitsvermittlungszentren (Navendên navçaya jiboyî pêgihandina kar) li rêklamê li karkergerînê temaşe bikin û evjî di rojnama dene, di rêkla-

mên demkî dene, herwuha di Internet de weke mînak didin wek mînak

[www.arbeit.swiss](http://www.arbeit.swiss)  
[www.suedostschweizjobs.ch](http://www.suedostschweizjobs.ch)  
[www.jobs.ch](http://www.jobs.ch)

### Çibikin ger bê karbin?

Herkese, herkeseke li Swîsre bijî û lê kar bike (çi mêr dibe, çi jin dibe) û bêkar (betal) bibe, heger merc temambin – mafê wî, mafê wê heye – perê li cihê mûçe bistîne. Mercê bingehîn û pêwîst hebûna destûra manê û cênişbûnê û dibe 12 meha di herdû salên dawî pêş windakirina kar de, kar û xebat kiribe.

Jiboyî pirsên pêwendî bi betalî bêkariyê hebin û karin pêwendiyê bi kesên bêkar re bikin ew di xizmeta we dene herwuha Regionalen Arbeitsvermittlungszentren (Navendên navçe jiboyî pêgihandina kar) jî di xizmeta we dene.

Heger we cihê karê xwe wûnda kir, yan tîrsa bêkariyê heye, wate tîrsîna wendakirina cihê kar, dibe haya xwe ji vana binin:

- Heger we hê dest bi lêgerîna li kar nekiribe, dibe hûn yekser dest bi lêgerîna li karekî nû bikin. Ev çarêxwekirin jiboyî wergirtin

û standina mafê parê ji sîgorta jiboyî dema bêkariyê re pêwîst û merc e, ku weke belge di destan de hebe. Ligor wê jî not û kopyên nivîsên hatine şandin jiboyî likar gerînê û nivîsên wernegirtin û qebûlnekirinê dibe bêne dokûmente kirin û bi belge hebin.

- Yekser û bê rawestan xwe li ba fermangeha (dayîra) kar qeyd bikin, fermangeha berpîrsiyara navçe hûn lê dijîn û têde cênişin. Hûn karin zanîn û agahdariyên bêhtir di vê malperê de peyda bikin

[www.kiga.gr.ch](http://www.kiga.gr.ch) oder  
[www.arbeit.swiss](http://www.arbeit.swiss)

### Karê bi reşî

Karê ku car carna jî dikin weke karê pakijkirin û maliştin kirinê, xwedîkirin, guhdan û çavdêrana zarokan, karên nava malê û karê bexça, yê ku bi pera dikin, kar û xebat hisabe û dibe ji aliyekî ve destûr we ya kar ji aliyê polîsen biyaniyan ve hebe û ji aliyê din ve dibe liba sîgortayên çivakî û komelayetî hatibe qeyd kirin, yan dibe we qeyd kiribe. Heger ew karane nehatibin qeydkirin, wate karê bê destûr, karê reş e (karê bireşî) ye û di dema bêkarî, wata windakirina kar

de, di dema bela biserde hatinê û di dema bûna kêmandamiyê, hûnî ne sîgorta kirîne, wate sîgorta we tune.

**Staatssekretariat für Wirtschaft SECO  
(Nünerê wezareta – Wekilê wezaretê û şalyariyê – aborî)**

☎ 058 462 56 56

[www.keine-schwarzarbeit.ch](http://www.keine-schwarzarbeit.ch)

### **Pîşefêrbûn û xwepêşxistina dû pîşefêrbûnê**

Di Berufsinformationszentren (navendên zanîn û agahdariya pîşe) yê navçande zanîn û agahdariyên cûre cûre peyda dibin. Jiboyî zanîn û agahdarîyan herwuha jiboyî peyvînen kurt û kin stafa bipîr (karkerên beşê pêwîst) di xizmeta we dene. Serdan bêperrey e û belaş e û di demên kar de, bê berê xwe qeyd bikin jî çare heye (çê dibe). Sebare (jiboyî) bi şîretkarî û amojgariyê çaweytiya karîra we ya kesî, dibe mesrûfa wê bê dan û demek jiboyî peyvîna were xwestin.

Hûn karin zanîn û agahdariyên din, yên sebare bi şîretkarî û amojgariya jiboyî, xwenda bilind, û çaweytiya karîra pîşe, herwuha sebare bi navendên şîretkarî û amojgariyê li navçê, li malpera jêrîn

û bi telefona jêrîn werbigirin

**Amt für Berufsbildung Graubünden  
(Fermangeha Pîşefêrbûna)**

☎ 081 257 27 68

[www.berufsbildung.gr.ch](http://www.berufsbildung.gr.ch)

### **Sepandin û qebûlkirina dîplomên biyanî**

Eger pirsên we di derbarê nasîkirina/îtrafa bawernameyên/şehadeyên biyanî hebin, hûn dikarin peywendiyê bi Navenda Têkiliyên Neteweyî ya Sekreteriya Dewletê ji bo Perwerde, Lêkolîn û Dahênanê bikin.

**Staatssekretariat für Bildung,  
Forschung und Innovation SBFI  
(Sekreteriya Dewletê ya ji bo Perwerde,  
Lêkolîn û Nûjeniyê)**

☎ 058 462 28 26

[www.sbfi.admin.ch](http://www.sbfi.admin.ch)

Heger we çendê sala di karekî de zanîn peyda kiribe û di wî karîde karkiribe, hûn karin dibin hinek mercan de, wê fêrbûn û zanîna xwe li Swîsre weke pîşefêrbûnekê bidin qebûl kirin û dîplomake pîşeyekî sepanî wergerin.

**Amt für Berufsbildung Graubünden  
(Fermangeha Pîşefêrbûna)**

☎ 081 257 27 68

[www.berufsbildung.gr.ch](http://www.berufsbildung.gr.ch)

Konferansa Serperîştan ya Zankoyên  
yê Swîsreyê [swissuniversities](http://swissuniversities)

**Rektorenkonferenz der Schweize-  
rischen Hochschulen (Konferansa  
Serokên Zanîngehên Swîsre)**

☎ 031 335 07 40

[www.swissuniversities.ch](http://www.swissuniversities.ch)

# DESTÛRDANA MANÊ Û ANÎNA MALBATÊ

Daxwaziya wergirtina destûra manê û cênişînê ji hemwelatîyên dewletan EU / EFTA re kare berî hatina Swîsre ango piştî hatina Swîsre bê kirin. Destûra manê û cênişînê jiboyî kesên karker re ji hemwelatîyên welatên sêyan re (Hemwelatîyê wan welatan, yê ku ne endamên di EU / EFTA de) tenê di rewş û derfetên awerte de didin. Wate heger destne karkere zorzan bin û pispor bin, ango heger wûsa û sedemen taybet hebin, ku dana destûra manê heq bike.

Hemdewletî yê EU/EFTA (EU: Yêkitîya Avrupa, EFTA Sazîya Avrupabo bazirganî ya serbest) dikarin malbatî yê xwe, mafê wan li ser îkametê her çawa jî be, bînen ba xwe. Malbatî Dê, Bav û zarokin. Ew kesên kû ji dewletek sêyemîn de xwedîyê mafê lê îkamet kirinêne, dikarin gora Şertên Zagonê di berhemberî dayra Pernaberî û mafên sîvîl (Amt für Migration und Zivilrecht) serîlêbixin û dawa hatina cenhev ya malbatîyên xwe (wek jin anjî mêrê xwe, anjî Dê û Bavê xwe) bikin. Awa serîlêxistina ji bo malbatîyan ger di navbîna 5 salan û ji bo zarokên li ser 12 salî jî, ger di navbîna yêk salekede bê kirin.

Di dayra Pernaberî û mafên sîvîl ya Graubünden (Amt für Migration und Zivilrecht), yanjî di malpera wan di internetêde di derheqê mafê îkamet kirin û mafê dawa kirina hatina cemhev ya malbatîyan agahî û Broşur bi zimanê Almanî û Îtalî amadene.

**Amt für Migration und Zivilrecht Graubünden AFM (Dayra Penaberî û mafên sîvîl ya)**

☎ 081 257 30 01

[www.afm.gr.ch](http://www.afm.gr.ch)



# MAHRKIRIN (ZEWAC) Û MALBAT

## Mahrkirin (Zewac)

Dibe mirov li Swîsre 18 e salî be, heta mirov karîbe mahra xwe bibire. Tenê ew mahrbirînên li fermangeha barê kesayetî (dayra nifûsê) hatine birîn, têne qebûl kirin. Fermangeha barê kesayetî (dayra nifûsê) a navçe cihê hûn lê rûniştine, wate cênîşbûne, wê agahdariya liser merc û belgêyen pêwîst ji mahrbirînê re ji were bêjin.

## Hevjîn û malbatên du-neteweyî

Li Swîsreyê ji her sê zewacan yek jê du-neteweyî ye. Li ser malpera [www.binational.ch](http://www.binational.ch) mirov dikare bersivên wan pirsan bi dest dixê, ew yên ku hevjin û malbatên du-neteweyî rûberûyê dihên.

[www.binational.ch](http://www.binational.ch)

## Hevseriyên qeydkirî

Hevserên ji yek cinsî (mêr û mêr yan jin û jin) karin hevserîtiya xwe qeyd bikin. Fermangeha barê kesayetî (Dayîra nifûsê) we agahdar dike bê çî gav ji were pêwîstin û dibe hûn çî gava bavêjin.

## Zewaca bi zorê

Li Swîsre mafê herkesî heye

hevserê xwe, wate şîrkê jiyana xwe bi serbestî bi xwe hilbijêre. Ligor wê ne mafê malbatê heye ne jî mafê tu mirovekî heye, jin dibe yan mer dibe, lidijî xwesteka wan mahra wan bibirin, wate mêr bike, yan jin bîne, wate kes nayê mecbûrkirin jiboyî mahrbirînê.

## Fachstelle Zwangsheirat (Dezgeha taybet ya Zewaca bi Zorê)

☎ 0800 800 007 (Xeta alîkariyê ya bê beramber)

[www.zwangsheirat.ch](http://www.zwangsheirat.ch)

## Jidayîkbûn

Her jidayîkbûneke bibe dibe Fermangeha barê kesayetî (Dayîra nifûsê) bê agahdar kirin. Heger zarok li nexweşxanê ji dayik bibe wê demê nexweşxane agahdar dike. Heger zarok li malê ji dayik bibe wê demê pîrik dibe jidayîkbûna zarok agahdar dike.

### **Mana dayikên zarok li mal û mûçê û maaş wan, Perê dema çavdêriya nûdayîkan**

Mafê wan jinan heye mûçê mana dayikên zarok li mal wer bigirin, ewên di dema bûna zarok de kardikirin. Mercê wê ewe, ku di her 9 mehên berî bûna zarok bi sîgorta bûn û di vê demê de bi kêmanî 5 mehan kar dikir. Mafê wergirtinê ji roja bûna zarok ve destpê dike û derengtîrîn dem 14 heftîya piştî bûna zarok tewa dibe. Di vê demê de wê heta bi 80 % î ji mûçe wergire, belê rojê ne bêhtir ji CHF 196,—.

**Sozialversicherungsanstalt Graubünden SVA (Saziya sîgorta civakî ya herêma)**

☎ 081 257 41 11

[www.sva.gr.ch](http://www.sva.gr.ch)

xelaskirina 25 sala be. Li gor rêzik û ûsûlê karbidest wate xwediyê kar perê piştgirîya malbatê dişîne. Di bin hinek mercên taybet de, karin hinek dê û bavên karnakin jî piştgirîya zarokan bistînin.

**Sozialversicherungsanstalt Graubünden SVA (Saziya sîgorta civakî ya herêma)**

☎ 081 257 41 11

[www.sva.gr.ch](http://www.sva.gr.ch)

### **Perê piştgirîya malbatê**

Mafê karkeran heye, çî jin dibe, çî mer dibe perê piştgirîya malbatê bistînin. Mehane piştgirîya zarokan ji zarokên heta bi 16 saliyî bin CHF 220,— dikeve. Her meh CHF 270,— ji ciwanan re derdikeva heta pîşe xelas bikin û biqedînin, belê derengtîrîn dem dibe temenê wan (Emrê wan, yaşê wan) nebêhtir ji



## ZAROK

### Mezinbûn bi pirrzimanî

Zarok her jidaybûna xwe ve dikare du zimanan an bêhtir fêr bibe. Di şîretdayîna dê û bavên «Bi min re bipeyive û guhdariya min bike!!» de hûn dê şîretan bigrin, ka hûn çawa dikarin bi zarokê/a xwe re alîkar bin ku di pirrzimaniyê de pêşve here. Belavok bi 14 zimanan hene. Ew dikare bê beramber were daxwaz kirin

#### Fachstelle Integration Graubünden (Beş û berpirsiyariya guncandinê)

☎ 081 257 26 38

[www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch)

### Şêwirya dê û bavên

Dê û bavên bebek û zarokên biçûk dikarin peywendiyê bi şêwirya dê û bavên re bikin. Li wir ji bo pirsên girêdayî xwarin, çavdêrîkirin û perwerdekirinê hûn dê piştevaniyê werbigrin. Her weha eger zarokê/a we gelek bigrî yan ne rehet be, dê alîkariya we were kirin. Ji bo vê yekê hûn dikarin li navendeke şêwirmendiyê bigerin. Li ser daxwaza we şêwirmendên dê û bavên dikarin seredana we li malê bikin an bi rêya telefonê an jî online agahiyên bi we re parve bikin.

Hûn dikarin li ser karûbarên şêwirmendiyê yê li herêma xwe zanyariyan ji rêvebiriya cihê-rûniştinê

ya herêma xwe werbigrin.

### App-ên malbat- û dê û bavên

Gelek App-ên baş bi kar tên hene, dikarin ji bo karûbarê rojane û di biyavên cuda cuda de piştevaniya dê û bavên bike. Hindek ji wan pirrzimanî û bê beramber in.

**Parentu** – şîret ji bo dê û bavên zarokên wan di navbera 0 û 16 salî de

**Kleine Weltentdecker (Lêkolînerên cihanê yê biçûk)** – şîret ji bo dê û bavên zarokên wan biçûk

**Erste Hilfe (SRK)** – alîkariya destêki ji bo rewşên tengav

### Deynkirtina pirtûk û lîstikan

Li dever û cihên cuda cuda di herêmê de pirtûkxane (pirtûk) û Ludothek (ji boyî tiştên lîstikê) hene. Bi perakî mirov di kare pirtûk û lîstokan ji wûr bideyîn bîne. Agahîyên li ser we hûn li Der û Dora xwe ji xwe re distinin.

Pirtûkxaneyên bajar li Chur hejmareke mezin ji alavên ragihandinê bi zimanên biyanî dixezin xizmeta we de. Ew êvaran û dawiya hefteyan jî vekiriyê.

### Bernameyên çavdêrîkirinê

(Bi pera ye, wate ne belaş e)

#### Koma lîstikê

Heftiyê carekê heta bi dicaran zarok

berî çûna baxçê zarokan hevû din di koma zarokan de dibînin. Di koma lîstikê de zarok fêrdibe di çarçoveyekî diyar de taqînewe û tecrûbên xweyî pêşî li dervayî malbata xwe çêbike. Hûn karin zanîn û agahdariyan sebarek bi vê ji birêvebiriya tax, tar, mehele yan gundê xwe werbigirin û bistînin.

### **Baxçeyên bebekan û çavdêriya zarokan ya rojane**

Cihê çavdêrîna zarokan guhê xwe didin zarokan û li wan guhdar dibin heta dest bi xwendegehê dikin. Hûn karin zanîn û agahdariyan sebarek bi Cihê çavdêrîna zarokan ji birêvebiriya tax, tar, mehele yan gundê xwe werbigirin û bistînin.

#### **famur – für Familien in Graubünden (Ji bo malbatan li Graubünden)**

☎ 081 300 11 40

[www.famur.ch](http://www.famur.ch)

Malbatek kare bi roj guhê xwe bide zaroka. Malbata bi roj li ba xwe li mala xwe, guhê xwe dide zarokê her temen û emrê, zarokan diçin xwendegehê jî. çî demê guhê xwe bidin zaroka, wate dema guhdan û çavdêrîna li zaroka (Firavîn, nîvrojê, alîkariya jiboyî erkên xwendegehê, alîkariya jiboyî erkên xwendegehê, rojê hemuwî ango dawiya heftiyê)

herkes biserê xwe li hev dikin û bihevre girêdidin.

### **Çalakîyên ji dervayî xwendegehê tene pêşkêş kirin**

Sebarek bi pirsê jiboyî xwedîkirina zaroka (Kinderhort), Firavîn (Nanê nîvro) yan betlana demên serbest (Ferienpass) pirsê xwe ji birêvebiriya xwendegehê bikin, ango ji fermangeha li herêmê berpirsiyar bikin.

#### **Amt für Volksschule und Sport Graubünden AVS (Fermangeha jiboyî spor û xwendegeha gel)**

☎ 081 257 27 36

[www.avs.gr.ch](http://www.avs.gr.ch)

### **Hêla rewşa tengav ya dê û bavan**

Perwerdekirina zarokan ji bo dê û bavan hertim zehmetiyek mezin e. Hêla rewşa tengav ya dê û bavan ji bo pirsên girêdayî perwerdekirin, nakokî, kirîzên di nav malbatê de bi şev û roj bi rêya telefon an E-mail ji we re bê beramber şêwirmendî û alîkariyê pêşkêş dike.

#### **Hêla rewşa tengav ya dê û bavan**

☎ 0848 35 45 55 (Tarîfa xeta erdî)

[www.elternnotruf.ch](http://www.elternnotruf.ch)

# XWENDEGEH Û PÎŞEFÊRBÛN

Li Swîsre pergala xwendinê ji herêmê heta bi herêma din jihev cuda ye. Li herêma Graubünden xwendegeh ji 7 heta bi 16 salî neçar, mecbûre û belaşê.

## Bexçê zarokan

Ji pênc saliyê ve zarok diçine baxçê zaroka. Jiboyî dû sala, wate dû sala dimîne.

## Mecbûrî û neçareyîya çûna xwendegehê

Mecbûrî û neçareyîya çûwuna xwendegehê ji wê sala, ku zarok dibine heft salî destpêdike.

## Pergala xwendinê û xwendegeha li herêma Graubünden

Bexçê zaroka		2 sala
Xwendegeha Serêtayî	Xwendegeha serêtayî	6 sala
Xwendegeha Navendî	Xwendegeha Nevendî, Sinifa/sefa piçûk	3 sala
Xwendegeha Amedeyî	Sala 10 an ya serbest, Xwendegeha Nevendî jiboyî beşekî xwendinê, Fêrbûna pîşe/Fêrbûna di cihê karî jiboyî fêrbûnê de weke şagirtî, Xwendegeheke taybet li Swîsre Diber fêrbûna pîşe re, yan piştî xelas kirina pîşe, dûre mafê xwendina bilind jiboyî beşê xwendinê heyê	2 – 5 sala
Xwendina bilind	Xwendegeha bilintir ji beşekî re, Xwendegeha bilind ya beşekî Zanîngeh, Xwendegeha bilind jiboyî sazumanî û pîşesaziyê (ETH)	3 – 6 sala

Zanîn û agahdarî liser hemû mijarên liser xwendegehan hûn dikarin ji xwendegehan wergirin yan jî li ba

**Amt für Volksschule und Sport Graubünden AVS (Fermangeha jiboyî Xwendegeha gel û spor)**

☎ 081 257 27 36

[www.avs.gr.ch](http://www.avs.gr.ch)

### **Berpirsyariya dê û bavan**

Dayik û bav berpîrsîyarê perwerde û xwendina zarokên xwe ne. Hûn mecbûrin zarokên xwe bişînin xwendegehê û hêya xwe jêbînin, ku ew herne xwendegehan û ligor sazûman û qeyda ji xwendegan re, û ligor plana wan û dersan biçin. Herwûha hûn mecbûrin hêya xwe jêbînin, ku zarokên we li malê erkên xwendinê (dersê yê dibe li mal bikin) û dibe hûn ji vê yekê re merc û çarçova pêwîst peyda bikin û ji wan re pêşkêş bikin. Li Swîsre cihekî navendî ji hevkarîya dinava xwendegeh û dayik û bavan de heye. Xwendegeh dayîk û bavan bi şeweyekî berdeyam û întîzam dixwîne û vedixwene xwendegehê jiboyî hevpeyvînan û êvarên dayîk û bavan. Beşdarbûna dayîk û bava gelek girînge, jiboyî hayjêanîn û wiryabûna li astengî û kêşên zarokan li xwendegehê ango jiboyî baştirîn çareserî jiboyî hilbijartina pîşe.

### **Şîret kirina bê pere ya li ser meslekan ji bo keç û xortan**

Şîretkirên Mesek-, xwendina bilind- û herwaha bo guhertina karê xwe wê alîkarî ya keç û xortan bikin, ku ewana bikarin ji bo xwe meselek,

xwendina bilind, an ji guhartina karê xwe, biryarê bidin. Ew bi awa peyvîn, ahgahî û test kirinê alîkarîya we dikin kû hûn biryara xwe bidin. cîhê şîretkirinê yê Kantonan li bajarên Chur, Davos, Illanz, Poschiavo, Roveredo, Samedan, Scuol û Thusis in.

#### **Amt für Berufsbildung Graubünden (Fermangeha jiboyî fêrbûna pîşe)**

☎ 081 257 27 68

[www.berufsbildung.gr.ch](http://www.berufsbildung.gr.ch)

### **Xwendegehên berdewamiya xwendinê û xwendegehên pîşe**

Piştî qedandina dema xwendegeha neçar, lazim û bi mecbûrî, suxte biryara xwe didin bi çî şêwe û derfetî li xwendinê berdewambin, ew hildibijêrin, gelo biçine xwendegeha gelemperî jiboyî berdewamiya xwendinê yan jî xwendegeha jiboyî fêrbûna pîşe.

### **Bernameyên navberê**

Ciwanên ku piştî xwendina xwe ya bingehîn hîn cihek ji bo xwendina pîşeyî ji xwe re nedîtine, dikarin serî li bernamêya navberê bidin. Ev yek dikare bibe alîkar, ew kêmasiyên di dema xwendinê de çêbûnî kar li ser bê kirin û fersendên pîşeyî pêş bixe.



Li ser van bernameyan pêşwext ji mamoste yan şêwirmendiya pîşeyî bipirsin.

### Ciwanên ku dereng koç kirine

Li ser şensên beşdarbûna mirovî di jiyana abûrî û civakî de, perwerde biryarê dide. Ji ber vê yekê pirr girîng e ku ew ciwanên biyanî-ziman, ew ên xwendina xwe ya bingehîn li welatê xwe qedandine û bi rêya programa hevghandina malbatê hatina Swîsreyê rêya xwe di nava sîstema perwerdeyî de bibînin.

Bernameyên perwerdeyî, yê ku bi taybetî li gorî pêdiviyên ciwanên biyanî-ziman têne pêşkêş kirin, alîkar in wek di bernameya navberê an jî di xwendina pîşeyî de. Zanyarî û şêwirmendî ji bo bernameyên perwerdeyî hûn dê li vî cihî bibînin

#### Informationszentrum Integration Graubünden (Navenda Agahdariyê ya Întegrasyonê)

☎ 081 257 36 83

[www.integration.gr.ch](http://www.integration.gr.ch)

### Gymnasien, Xwendegehên bazirganî – û yê navendiyî ê beşan (xwendegehên jiboyî xwendina gelemperî, wate tevî û gişkî)

Hûn karin zanîn û belgeyan liser pêkêşiyên cûre cûre libin malperên jêrîn bibînin

[www.bks-campus.ch](http://www.bks-campus.ch)

[www.ahb.gr.ch](http://www.ahb.gr.ch)

### Pîşefêrbûn

Dema jin û merên ciwan biryara xwe bidin piştî xwendegehê hînî pîşeyekî bibin, weke mînak bixwazin bibin terzî yan elektrîkçî yan her pîşeyekî din, ew karin wî pîşeyî bixwînin û xwendina xwe xelasbikin. Ligor peymaneke pîşefêrbûnê, şagirt li cihê karê xwe fêrî dike weke karker bixebitin û mûçe jiboyî karê xwe ji karbidest bistînin. Heftiyê rojekê du rojan diçine xwendegeha pîşe û vê dema dina mayî li kargehê kar dikin û hînî kar û zanebûnên ligor praktîkê dibin. Fêrbûna pîşa dû heta bi çar salan dikşîne û bi dîplomeyeka pîşe (Berufsattest) ji hêla Sondxwarê Hevalîniyê (eidgenössischen) ango bi nasnameyêke karîbûn û bi qudertê ve bidawî dibe. Herdû encam li seranserî Swîsre sepandîna û tê qebûl kirin.



### Bekaloriya pîşeyî

Bekaloriya pîşeyî perwerdeya pîşeyî di gel perwerdeya giştîrî de temam dike. Ev şensê bidestxistina cihekî di dibîstanên bilind de (FH) xweş dike. Bi encamdana ezmûneke temamker xwendin li zanîngehekê jî dibe.

### Xwendina bilind û xwendina bilinda di beşên huner û xwendinê jiboyî karê sazîyen netewî û navnetewî

Li herêma Graubünden pêşkêşiyên hijmarek baş ji xwendegehên bilind, xwendegehên bilindtir jiboyî hinek beşan û xwendegehên û sazîyen lêkolînê hene.

#### Amt für Höhere Bildung Graubünden (Fermangeha jiboyî xwendina bilind)

☎ 081 257 61 65  
www.ahb.gr.ch

### Xizmetguzariya derûniya (pisîqolojîya) xwendegehê

Ev pêşkêşiya şîretkarî û amojgariyê xwe digre li bexçên zarokan- û xwendegehên gel, heger li van di demên ferbûna li xwendegehê de, di pêşketinê de, di tevgerîn û rabûn û rûniştinê de ango di hest û

hestpêkirinê de zehmetî û astengî peyda bibin yan xuya bibin. Ev xizmetguzariya tê pêşkêş kirin ji dê û bavan re, ji zarokan û ciwanan re, ji kesên fêr dikin û kesên perwerde dikin re di guman alîkarî jiboyî alîkariya xwe bixwe bikin.

#### Amt für Volksschule und Sport Graubünden AVS (Fermangeha jiboyî Xwendegeha gel û spor)

☎ 081 257 27 41  
www.avs.gr.ch

### Tundûtîjî (şidet) li dijî zarokan

Dema kû Zarokek nîşanên Şidetê nîşan bide, wê demê Têkilî bi we navenda Şêwirdariyê ya alîkariya Qurbanîyan ji bo Şêwirdarî û Alîkariya profesyonel bê dayîn.

#### Beratungsstelle Opferhilfe Graubünden (Alîkariya qurbaniya- Cihê kar jiboyî şîretkarî û amojgariyê)

☎ 081 257 31 50  
www.soa.gr.ch

## Pisîkiyatriya zarok û Ciwanan Li Graubünden

Heger zarokê te yan zaroka te pirs-girêk, astengiyê û kêşeyên wî yan wê yê derûnî hebin, zehmetiyên wî yan wê bi wî yan bi wê bixwe re hebin, di malbatê de hebin, di dan û standin û rabûn û rûniştina bi hevalan re hebin ango pirs-girêk û astengiyên wî yan wê bi yasa û zagon û qanûn re çê bibin, hûn karin dan û standin û pêwendiyê bi Kinder- und Jugendpsychiatrie Graubünden (kjp) re bikin.

**Kinder- und Jugendpsychiatrie  
Graubünden kjp (Pisîkiyatriya zarok û  
ciwanan)**

☎ 058 225 19 19

[www.kjp-gr.ch](http://www.kjp-gr.ch)

# CÊNIŞÎN Û BICÎHBÛN

## Lêgerîna li xaniyan jiboyî bikirê girtin

Rêklamê xaniya di rojnama rojane ya navçe û devera we deye, di rojnaman û di înternê deye. Carna jî xaniyên erzan li cihê reklamê mişteriyên bi dîwarê dikan û molên mezin ve hene minak weke Migros û Coop peyda dibin.

[www.immoscout.ch](http://www.immoscout.ch)  
[www.homegate.ch](http://www.homegate.ch)  
[www.comparis.ch](http://www.comparis.ch)  
[www.newhome.ch](http://www.newhome.ch)  
[www.suedostschweiz.ch](http://www.suedostschweiz.ch)

Dema dilê we biser xaniyekî ve hebe, sererast û bi rêzik û ûsûl wûhaye dive mirov formekê dagire û dibe hinek belge û dokûmenta weke kopiyekê ji qeydiya destserdanînê (Betreibungsregisterauszug) û herwûha destûra man û cênişîna we bidine xwediyê xanî an jî birêvebirê xanî.

## Giringe:

- Liser rêklamê xaniya, mirov pêwendî û daxwazîyê dike û kirêdar kirêçiyekî hildibijêre.
- Hêya xwe ji mercên berat û peymanê (Akîdê) bînin, weke

minak demên karibin ji xanî derkevin.

- Di xaniyê kirê de sazûmen û qeyda xaniyan heye, ew jî bihevre jiyana di xaniyan de sazûman dike (Weke minak hêminî û bêdengiya bi şêv, yan jî bikar anîna mekîna şîştina cila).
- Di her xaniyekî kirê de çavdêrekî xanî yan çavdêreke xanî hêya, ew heya xwe jêtina ku sazûman û qeyda xaniyan bicî bibe û hêya xwe ji pakijî û şuştina xanî tîne.
- Her malbatek neçar e ku heqê radyo û televîzyonê bide. Mirov fatûrê bi şeweyek otomatîkî ji rêveberiya ajansa baca radyo û televîzyonê ya Swîsreyê (Serafe) werdigire.

## Serafe AG

☎ 058 201 31 67

[www.serafe.ch](http://www.serafe.ch)



Zanîn û agahdariyên din û broşûreke liser mijarê «niştecêbûn» (Wohnen) bi 11 zimanan peyda dibe û hûn dikarin wergirin ji

**Bundesamt für Wohnungswesen BWO  
(Fermangeha federal jiboyî karûbarê xaniyan)**

☎ 058 480 91 11

[www.bwo.admin.ch](http://www.bwo.admin.ch)

### **Cihê şîretkarî û amojgariya yasa û zagone kirê**

Mieterverband Graubünden (Yekîtiya kêrvanan – kirêçiyên) agahdarî û bersiva dide liser pirsên pêwendî bi kirêgirtin û xanî ve hebe. Ev xizmet ji bo ne-endaman bi pere ye.

**Mieterverband Graubünden (Yekîtiya kêrvanan – kirêçiyên)**

☎ 081 253 60 62

[www.mieterverband.ch](http://www.mieterverband.ch)

Heger dûbendî peydabûn û çêbûn hûn karin pêwendîyê bi birêvebirîya tax, tar, mehel an jî gundê xwe re bikin, jiboyî wergirtina navnîşanên cîh û deverê berevanî û lihevanîne. Ev xizmet ji bo ne-endaman bi pere ye.



# TENDURISTÎ

Zanyariyên berfireh li ser mijara «tendirustiyê» Li ser portala Înternêta [www.bischfit.ch](http://www.bischfit.ch) û [www.migesplus.ch](http://www.migesplus.ch) hene. Bi taybet «Rêbernameya tendirustî», ku bi zimanên cuda cuda heye, dihê pêşinyar kirin.

[www.bischfit.ch](http://www.bischfit.ch)  
[www.migesplus.ch](http://www.migesplus.ch)

## Navnîşanên bijîşkên jin û bijîşkên mer

Di her pirtûkeke telefonê navça we de telefon û navnîşanên bijîşkên li dever û navça we kardikin nivîsîne û qeydkirîne.

## Nexweşî yan belabiserde hatin (qeza kirin)

Li Swîsrrê wüha ye, ku herkesekî bijîşkê wî yê malê yan bijîşka wî ya malê heye, yê yan ya di demên nexweşî yan bela biserdehatinê de yekem kese ku mirov pêwendiyê pêdike. Heger we bi telefonê nikarîbû bijîşkê xwe yê malê yan bijîşka xwe ya malê zêft bikin, guhdariya makîna bersivdanê bikin, jiboyî standina hejmara bijîşkê niwêner yan bijîşka niwêner yan jî bijîşkê dikarde yan bijîşka dikarde. Herwüha hûn dikarin pêwendiyê bikin bi xizmetguzariya di derfetê û haletê kutûpir yê nexweşxana

nêzîkî xwe de.

Di dema pêwîstiya bilez û yekser telefonê bidin

**Hijmara pêreghiştin (firyakeftin) di derfetên kutûpir de**

☎ 144

## Li dema hewarê çi bikin? (Ku ketin tengayiyê çibikî?)

Seyrî bendê 21 an, Rûpelê 66 an bikin

## Nexweşxane

Ji bo pirsgirêkên tendirustî ew ên pêdivî bi pişkinîn, çareserî an niştergeryeke zêdetir hebe bijîşka/ê we ya/ê malê dê we bişîne cem bijîşkeka/î taybetmend an jî nexweşxaneyekê. Zanyariyan jî tamîna xwe ya tendirustî werbigrin, ka hûn dikarin li kîjan nexweşxaneyê werin derman kirin.

## Şîretkarî û amojgarî û guhdan û çavdêrana li mal

Hûn ji encamê nexweşiyekê yan belak biserê we dehat pêwîstî alîkariya kesekî ne ku jiboyî karûbarê malê alîkariya we bike, wê demê hûn karin pêwendiyê bi «Spitex» (Jiboyî alîkarî û yarmaetî lidervayî nexweşxanê) a li nêzîkî mala we re bikin.

**Spitex Graubünden**

☎ 081 252 77 22

[www.spitexgr.ch](http://www.spitexgr.ch)**Mirovên bitemen, wate mirovên kal û pîr**

Pro Senectute şîretkariyê û amoj-gariyê li mirovên temenê wan mezin dike û di dema pêwîst de li mal çavdêrî û guhadana wan jî dike.

**Pro Senectute Graubünden**

☎ 081 252 75 83

[www.gr.prosenectute.ch](http://www.gr.prosenectute.ch)**Mirovên kêmanî, wate mirovên kêmaniyek li wan hebe**

Mirovên kêmaniyê wan yê laş wate fîzîkî yan yê derûnî hebin (bi Handicap bin) herwûha mirovên biwan ve girêdayî û mirovên pêwendîdar alîkariyê ji sazîya sîgorta civakî û komelayetî Graubünden yan li ba Pro Infirmis werdigirin, heger ew kesane zarok bin piştgêrî û alîkariyê ji perwerda saxkirinê di dema zû de (heilpädagogischen Früherziehung) werdigirin.

**Sozialversicherungsanstalt Graubünden SVA (Saziya sîgorta civakî û kolayetî)**

☎ 081 257 41 11

[www.sva.gr.ch](http://www.sva.gr.ch)**Pro Infirmis Graubünden**

☎ 058 775 17 17

[www.proinfirmis.ch](http://www.proinfirmis.ch)**Stiftung Heilpädagogischer Dienst Graubünden HPD (Sazî û sazûmana xizmetguzariya perwerda saxkirinê)**

☎ 081 257 02 80

